


**Elternservice**
Die Senatorin für Kinder und Bildung

Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

**Freie Hansestadt Bremen**

***Scan here for other language versions***

An
«Vorname_SB1» «Name_SB1»
«Straße»
«Ort»

Her zarok bi xêr were: „KOMM IN DIE KITA!“

Dêûbav û lênêrên qanûnî yên hêja,

di 1ê Tebaxa 2025an de sala pêş a baxçeyê zarokan dest pê dike û hêj jî ciyên vala Di salên dawî de li Bremenê kêmasiya ciyên baxçeyên zarokan hebû, û carinan dîtina ciyekî dijwar bû.
Êdî gelek ciyên nû yên lênêrîna rojane hatine sazkirin. Lê li Bremenê ji bajarên din kêmtir zarok diçin navendên lênêrîna zarokan a danê rojê, ji ber ku gelek dêûbav hîç nizanin, ku her çend "dema qeydkirina sereke" demek dirêj qediyabe jî, êdî dîtina ciyekî pir hêsantir e.

Ji bo zarokan çûyîna navendên lênêrîna zarokan a danê rojê pir hêja û girîng e. Têkiliya civakî bi zarokên din re, lîstin û fêrbûna bi hev re, kêfa wan tîne, pêşveçûnê pêş dixe, zarokan xurt dike û her wisa amadekariyeke baş e ji bo dibistanê.

Zarokê we jî dikare vê havînê biçe kreşê: li taxa we hîn jî ciyên vala hene!

Hûn hîn jî dikarin zarokê xwe ji bo ciyekî li kreşê li navendeke bi dilê xwe qeyd bikin. Ya baş li ser vê malperê **https://kitaportal.bremen.de**.

Ji bo vê yekê pêdivî bi vê Kinder-ID ya li jêr ê. Loma ji kerema xwe re vê nivîsê li cem xwe bihêlin.

**Girîng!** Kinder-ID tenê carekê dikare ji bo barkirina daneyên zarokan li hesabê portaleke lênêrîna rojane were bikaranîn. Loma divê hesabê cara pêşîn hatiye vekirin bi berdewamî were bikaranîn.

Di dema qeydkirinê de piştî ku we daneyên zarokî di gava yekem de bi serkeftî bar kirin, êdî hûn nikarin Kinder-ID û her wisa rojbûnê dubare bar bikin, lê dikarin tenê jixwe hatiye qeydkirin bitikînin.

Heger ji bo qeydkirinê pêdiviya we bi alîkariyê hebe, hûn dikarin telefonê me bike yan jî e-mailekê binivîsin. Li rûpela paş agahiyên pêwendiyê û navendên din ên şêwirmendiyê hene.

Li gel silavên germ

Xizmeta Dêûbavan



## Ihre Kinder-ID

für «Vorname» «Nachname», geboren am «Geburtsdatum»

ID: **«KinderID»**

## Kesê pêwendiyê

**Senatora ji bo Zarok û Perwerdehiyê**

Xeta me ya telefonê ya lênêrîna zarokan a danê rojê bi kar bînin.

0421 361-92000

Demên xeta telefonê:

Dûşem û Pêncçem ji 9:00 hete 11:00

Sêşem û Çarşem ji 13:30 hete 15:30

Hûn dikarin ji me re e-mailekê jî bişînin:

tagesbetreuung@kinder.bremen.de

**Navenda şêwirmendiyê navbeynkariya ciyên lênêrîna zarokan a danê rojê yên li seranserê bajêr**

PiB – Pflegekinder in Bremen gemeinnützige GmbH

0421 958820777

info@pib-bremen.de

www.pib-bremen.de

**Navenda şêwirmendiyê ji bo kreşên Paritätischen Gesellschaft ji bo xizmetên civakî**

0421 33703030

kitaberatung@pgsd.de

**Navenda şêwirmendiyê ji bo kreşên Verbund Bremer Kindergruppen**

0421 502663

kontakt@verbundbremerkindergruppen.de

**Bajarê Bremenê**

Teelefona gel

115

***Scan here for other language versions***

[Übersetzt in die Kurdische Sprache]